HEZÎRAN 2022

# The Hall KURDÎ



## QIRALÎÇE ELÎZABETHA II.: 70 SAL LI SER ERK
THE HALL KURDÎ

## ROZA SALIH: JI PENABERIYÊ BER BI ŞAREDARIYÊ
THE HALL KURDÎ

## 11. FESTÎVALA ELEWIYAN LI BRÎTANYAYÊ
THE HALL KURDÎ

## GERNAMEYA YÛNANÊ
NECAT ZIVINGÎ

www.thehallkurdi.com

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 6, Hezîran 2022

**Damezrîner**
Osman Kömürcü
Erol Başak

**Editor**
Erol Başak


**Rûpelsazî**
Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

**Bergsazî**
GrafiKURD

Navnîşan
**London UK**

**The Hall Kurdî**
Endama Koma
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdi.com
thehallkurdi@gmail.com
+44 7915 413436
@KurdiHall
TheHallKurdi
The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.*
*Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe berpirsin*
*û ne mecbûr in ku ew mîna yên weşanger û edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,*
*materyal û naverokên din bi niyeteke safî hatine amadekirin.*

# NAVEROK




**Nameya Edîtor**

Erol Başak ► 4




**Gernameya Yûnanê**

Necat Zivingî ► 18



**PLATINUM JUBILEE**

The Hall Kurdî ► 5




**MERYEM XAN: Dengbêja Hizin û Kederê**

Melahat Uluç Akıncı ► 22



**Di Hilbijartinê De Kurd Biserketin**

The Hall Kurdî ► 9




**PÎREMÊRD: Helbestvanekî Pêşeng**

Zülküf Ergün ► 26



**ROZA SALIH: Ji Penaberiyê Ber bi Şaredariyê**

Hevpeyvîn
Erol Başak ► 12




**ATOM EGOYAN: Derhênerê Navdar ê Ermen**

Rûmet Med ► 31



**11. Festîvala Elewiyan Li Brîtanyayê**

The Hall Kurdî ► 15



**Oksîjen Çawa Çêbû?**

Digikurd ► 34

# NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

*Silav dildarên zimanê şêrîn.*

Me meheke din li paş xwe hişt. Di meha Gulanê dê li Brîtanyayê 2 bûyerên sereke û girîng rû dan. Ya yekem di 5ê mehê de hilbijartinên herêmî hatin kirin. Partiya deshilat ango partiya Serokwezîr Borîs Johnson Conservativeyê şikestin xwar. Dengên Partiya karkeran Labour li gelek devaran bilind bû. Lê di vê hilbijartinê de serkeftina namzetên Kurd bal kişand. Em bêjin ne tu partî lê Kurd biserketin şaş nabe. Lewra ji 30 namzetên Kurd dora 25 kes li herêmên xwe biserketin û ketin meclîsên şaredariyên xwe. Kurdan li şaredariya Enfiled a Londonê hema ji sedî 30yê meclîsê bi dest xist.

Li Skotlandê jî serkeftina Roza Saliha keça Kurd a Başûrî hêjayî pesnê ye. Roza Salih ji Partiya Netewperwer a Skotlandê, SNP, kete hilbijartinê û bû yekem penabera hilbijartî di dîroka Skotlandê de.

Nûçeya serkeftina namzetên Kurd, peyamên wan û hevpeyvîna bi Roza Salih re di vê hejmarê de cîh digre.

A diduyan jî Jubîliya Platîn a Qiralîçe Elizabetha II. bû. Di dawiya meha Gulanê û destpêka meha Hezîranê de xelkê Brîtanyayê Jubîleya Platîn a Qiralîçeyê pîroz kir. Lewra Qiralîçeya 96 salî îsal 70 saliya xwe li ser têxt temam kir.

Paytext London di serî de li seranserê Brîtanyayê û welatên 54 Commonwealthê ku Qiralîçe seroka wan e, bi çalakiyên cur be cur û bi coş Jubîliya Platîn hate pîrozkirin.

Dîsa di dawiya mehê de li Londonê festîvala Elewiyên Brîtanyayê hebû. Festîvala ku cara 11an hate kirin, bi coş û şahiyeke mezin berdewam kir. Ji seranserê Brîtanyayê dora 60 hezar Elewî hatin festîvalê. Peyam û hêviyên rêveberên sazî û dezgehên  Elewiyan di hejmara Hezîranê de ye.

Nivîskar Necat Zivingî vê mehê ji me re gera xwe ya li Yewnanistanê nivîsî. Çavderiyên wî hêjayê xwendinê ne. Ez dibêm bila şopîner û meraqdarên nivîsên mamoste Zivingî jê nemînin.

Di salvegera mirina wî de em ê helbestvan, nivîskar û rojnameger Pîremêrd  bi bîr bînin. Mamoste Zûlkûf Ergûn ji bo The Hall Kurdiyê nivîsî:  Pîremêrd: Helbestvanekî Pêşeng

Babeteke din a vê hejmarê jî Dengbêja Hizin û Kederê Meryem Xan e. Rojnameger Melahat Uluçê ku li ser wê tez nivîsandiye, ew ê wek dosye di kovara me de behsa Meryem Xanê bike.

Ji bo hezkiriyên zanîst, teknolojî û sînemayê jî kovara me vê mehê jî têra xwe naverok  dihûndirîne.

Ji Londonê digel silavên germ…

*Şahî û xweşî her para we be.*

# QIRALÎÇE ELÎZABETHA II.: 70 SAL LI SER TÊXT

THE HALL KURDÎ



**BIHÊZTIRÎN JINA LI DINÊ**

Gava ew biçe cihekî her kes li ber wê radibe piyan, hemû serokdewlet û qiralên li dinê jî di nav de. Li gorî kanûnên neniviskî her kes li ber wê xwe kûz dike an serî ditewîne. Li cîhanê jineke di ser wê re bihêztir tune ye. Pasaporta wê nîne. Heqê wê heye ku bê pasaport biçe hemû welatan. Em behsa Qiralîçeya Brîtanyayê Elîzabetha II. dikin.

Dema ku ew di sala 1926an de li Mayfairê (London) ji dayik bû, Prînses Elîzabeth (niha Qiralîçe) û malbata wê hêvî nedikir ku ew ê rojekê bibe monark. Hêvî ew bû ku bi malbata xwe ya nêzik re jiyaneke normal bijî. Lê her tişt di Kanûna 1936an de dema ku mamê wê – Qiral Edward ê VIII. dev ji erka qiraliyetê berda, guherî. Bavê wê bû qral û ew jî herwisa bû welîahta yekem a qiraliyetê. Ji wê rojê vir ve jî bala cîhanê li ser wê ye.

Navê wê bixwe Elizabeth Alexandra Mary ye. Navê pîrika xwe Qiralîçe Mary û navê pîrika pîrika xwe Alexandra hildaye. Prînses Elîzabeth piştî mirina bavê wê Qiral George a VI. di Sibata sala 1952an de dibe qiralîçe. Ev 70 sal in li ser erka xwe ye. Di dîroka monarşiya Brîtanyayê de tu kes bi qasî wê dirêj li ser erk nemaye.

**COMMONWEALTH**

Queen Elizabetha II Seroka Commonwealthê ye.

The Commonwealth ango Yekitiya Netewan komeleyek



dilxwazî ya 54 welatên serbixwe û wekhev e. Li van welatan 2,5 milyar mirov dijîn. Di nava wan de aboriyên pêşketî jî hene, welatên ku pêşdikevin jî.

Ji van welatan Brîtanya, Canada, Avustralya û Zelandaya Nû jî di nav de 14 welat Elîzabeta II. wek qiralîçeya xwe nas û qebûl dikin.

Koka Commonwealth digihê Împaratoriya Brîtanî. Lê îro her welatek dikare bibe endamê Commonwealtha nûjen. Welatê herî dawî ku beşdarî Commonwealthê bûye Rwanda ye di sala 2009an de.

Îsal Qiralîçe Elîzabetha II. 70 saliya xwe li ser text temam kir. Û paytext London di serî de li seranserê Brîtantayê ev wek jubîliya Platîn hate pîrozkirin.

**JUBÎLÎ ÇI YE?**

Jubîlî, pîrozkirina jiyan û desthilatdariya monark e. Li şûna ku her sal biqewimin, jubîlî tenê qonaxên girîng destnîşan dikin û wan taybetmendtir dikin. Ji bo ku demek diyarkirî nîşan bide her Jubîlî navek xwe heye:

*Silver Jubilee 25 sal*

*Ruby Jubilee 40 sal*

*Golden Jubilee 50 sal*

*Diamond Jubilee 60 sal*

*Sapphire Jubilee 65 sal*

***Platinum Jubilee 70 sal***

*Centenary 100 sal*

THE QUEEN'S PLATINUM JUBILEE 2022



Yekemîn monarkê Brîtanî ku 50 saliya xwe li ser têxt pîroz kir George ê III. bû. Zêdetirî 200 sal berê di sala 1809an de.

Qiralîçe Victoria yekem monark bû ku di sala 1897an de Diamond Jubîliya xwe ango 60 saliya xwe li ser text pîroz kir.

Qiralîçe Elîzabetha II. di 2002an de Jubiliya xwe ya Zêrîn û di 2012an de Jubiliya Diamondê pîroz kir. Di 2022an de, Qiralîçe bû yekem monarka Brîtanî ya ku Jubîliya Platîn pîroz kir.

**ÇALAKIYÊN JUBÎLIYA PLATÎN**

Li ser navê qiralîçe xeta metroyê Elîzabeth Line hate vekirin. Qiralîçe di merasîmê de beşdar bû. Ev xeta metroyê pêşketîtirîn metro ye li Londonê. Nûjen, bilez, bêdeng û fireh e.

Rojbûna Qiralîçe ya fermî bi merasîmeke fermî li ber Qesra Buckhingamê hate pîrozkirin. Zêdetirê hezar û 400 esker, 240 hesp û 400 mûzîkjenên bandoya eskerî beşdar bûn. Ji xelkê jî bi hezaran kesî lê temaşe kir.

Qiralîçe li Brîtanyayê seroka artêşê ye. Loma xwepêşandanên eskerî di pîrozbahiyan de cîheke girîng girt. Hêzên esmanî yên Brîtanyayê li asîmanê qesra Buckinghamê korografîyek pêşand. Balafirên şer ji ser qesrê firiyan û li hewayê fîgûra 70 çêkirin.

Ji bo spasdariya desthilatdariya Qiralîçe Elîzabetha II. li katedrala St Paul ayînek hate kirin. Lê qiralîçeya pîr bi pêşniyara dixtorên xwe beşdar nebû. Kurê wê Prîns Charles li ser navê wê ayîn bi rêve bir.

London di serî de li seranserê Brîtanyayê û welatên Commonwealthê bo jubîliya qiralîçe partiyên kolanan, çalakiyên cur bi cur hatin kirin.

Di roja dawî ya çalakiyan de di ber qesra Buckinghamê derbasbûna fermî ya sembolîk a qiralîçe hate kirin. Qiralîçe beşdar nebû lê li ser cama erebeya ku hespan dikişand holograma qiralîçe cî girt. Ciwaniya qiralîçe silav li xelkê kir.

Heman rojê danê êvarê jî şahî û konsert hebûn. Diana Ross, Koma efsane The Queen û Ed Shereen jî hunermed û mûzîkjenên navdar yên Brîtanî kêf û coşa bi sed hezaran xelkê li ber qesra Buckhingamê anîn.

Gava tarî kete erdê jî xwepêşandanên sînevîzyon û lazerê pêk hatin. Li ser dîwarên qesrê bi resmên qiralîçe 70 salên wê yên li ser erk hatin nîşandan.

Qiralîçe Elîzabetha II. di vîdeoklîbeke BBC de jî list. Di vîdeoyê de karaktera anîmasyonê hirça bi navê Paddigton ji bo çaya saet 5an diçe qesrê, dibê mêvanê qiralîçe. Ev vîdeoya komîk bêguman yek ji demên herî balkêş yên jubîliyê



bû. Lewra qiralîçe cara yekem e çenta destê xwe vedike û dibêje sandwîça min her tim di çenta min de ye.

Di çarçoveya pîrozbahiyan de dora 13 milyon kes hatin paytext Londonê

**QIRALÎÇE ÇI DÎTIN LI VÊ DINE?**

• Qralîçe Elîzabeth II. di dema desthilatdariya xwe de, ji Winston Churchill bigirin heta Boris Johnsonî bi tevahî 15 serokwezîrên Brîtanî dîtin.

• Wê 13 serokên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dîtin.

• Wê şerê duyam a cîhanê dît.

• Mirovahî cara yekem gav avêt hîvê.

• Serokê Amerîkayê John F. Kennedy hate kuştin.

• Di dema desthilatdariya wê de Şerê Sar destpê kir û bi dawî bû, dîwarê Berlînê hate avakirin û hate hilweşandin.

• Êrîşa 11ê Îlonê ya li Amerîkayê hate kirin.

• Li dinyayê pandemiya Kovîd-19ê çêbû.

Kanala dewleta Îngilîstanê BBCyê kete arşîva qiralîçe Elîzabetha II. û derheqê wê de 2 belgefîlm amade kirin.

Belgefîlma bi navê 'Unseen Queen' ango 'Qiralîçeya ji Dûrê Çavan' bi wêne û vîdeoyên ku beriya niha li tu cihan nehatine nîşandan behsa qiralîçe dike. Qiralîçe Elîzabeth di vê belgefîlmê de bi xwe behsa jiyana xwe dike. Di belgefîlma din a bi navê "The Queen:70 Glorious Years" de geşedan û guherînên li Brîtanya û cîhanê hatiye vegotin. Ev her du belgefîlm li ser platforma dîjîtal ya BBCyê, iplayerê, heya 11 mehên din dê bikare bê temaşekirin.

**Qiralîçeya 96 salî bêguman xwedî tecrûbeyeke bêhempa ya jiyanê ye. Çend hevokên ji tecrûbeyên jiyana wê ku di belgefîlma Unseen Queen de bixwe bilêv dike, em li vir bihêlin.**

*"Ez têra xwe dirêj jiyam ku bizanim tişt tu carî ji bo demek dirêj wekî xwe nemînin"*

*"Li gorî ezmûna min nirxa erênî ya malbateke bextewar yek ji faktorên hebûna mirovan e ku qet neguheriye"*

*"Bawerî, malbat û hevaltî ji bo min tenê nebûne tiştên neguher, lê ji bo min bûne çavkaniya aramî û dilniyabûna kesane jî"*

# SERKEFTINA NAMZETÊN KURD DI HILBIJARTINÊN HERÊMÎ YÊN BRÎTANYAYÊ DE

THE HALL KURDÎ






Di 5ê Gulana 2022an de li seranserê Brîtanyayê hilbijartinên herêmî hatine kirin. Di van hilbijartinan de 30 namzetên Kurd jî hebûn û ji wan dora 25 namzet hatin hilbijartin.

Namzetên Kurd ên hilbijartî ji Başûr û Bakur in. Bi taybetî serkeftin û hejmara Kurdên Bakurî balê dikşîne.

Namzetên Kurd herî zêde li navçeya Enfileld a Londonê ji bo meclîsa şaredariyê hatin hilbijartin. Nifûsa Enfieldê dora 334.000 e û ew bi mezinahiya xwe di rêza 5an de ye li Londonê. Di vê hilbijartinê de hema hema ji 3an 1ê meclîsa Enfileldê ji nûnerên Kurdan pêk hat.

Şaredariyên Londonê ku namzetên Kurd lê biserketine wiha ne:

Enfiled, Harringay, Hacney, Harrow, Islington, Lambeth, Kensington and Chelsea.

Ji aliyê din ve li bajarê Glasgow ê Skotlandê jî Roza Salih hate hilbijartin. Roza Salih di dîroka Skotlandê de yekem kes e ku wek penaber hatiye wî welatî û piştî salan bûye endama meclîsa şaredariyê.

Li Lambetha Londonê ku navçeyeke navendî ye Ibrahîm Doguşê Meraşî ji nû ve hate hilbijartin. Ibrahîm Doguş heyama çûyî ji bo demekê bibû şaredar jî. Ji bilî wî di vê hilbijartinê de Kurdekî Başûrî Serbaz Berzencî jî ji bo şaredariya Lambethê hate hilbijartin.

Di civîna meclîsa Lambethê de Serbaz Berzencî wek Cîgirê Şaredar hate hilbijartin.

Cîgirşaredarê Lambethê Berzencî ji bo The Hall Kurdiyê axivî.

**Cllr Sarbaz Barznji**

**Cîgirşaredarê Lambethê**

Ez kêfxweş im ku dibînim bêtir Kurdên me bi awayekî aktîf beşdarî civaka Brîtanî dibin. Kêfxweş im, navê min Sarbaz Barznji ye û ez bi eslê xwe ji Başûr im; ez di xortaniya xwe de wek penagehekî hatim Londonê. Ez endezyarê saziya me û hîndekarê mêvan im li zanîngeheke li Londonê.

Beşdarbûna siyasetê di nav xwe de gelek çalakiyan dihewîne ku bi rêya wan mirov li ser cîhanê ramanên xwe tîne ziman û wan pêş de dixe. Meriv dibîne ew çawa tê birêvebirin û dixwaze tê de cî bigre û şikl bide biryarên ku tesîr li jiyana me dike

Prensîba rêveberiya demokratîk xwe dispêre wê baweriyê ku dibêje her kes mafê xwe heye beşdarî pêvajoya biryardayîna biryara ku dê jê tesîrdar dibe, bibe.

Siyaset ji ya ku em dizanin bêtir bandorê li jiyana me ya rojane dike. Siyaset zanista bikaranîna çêtirîn a çavkaniyan ji bo başkirina her kesî ye. Ew têgihîştin û jêhatîbûnek hêja divê.

Partiya Karkeran her tim bi gel re bû. Ew ji bo ku ji mirovên asayî re bibe dengekî ava bû û ji bo baştirkirina jiyana xelkî hêzê dixwaze. Partiya Karkeran xwedî dîrokek serbilind e ku di jiyana mirovan de li seranserê welatê me cûdahiyek mayînde çêkiriye, bi destkeftiyên ji NHSê bigrin heya mûçeya herî kêm.

Ez rasterast wek endamê meclîsa şaredariyê hatim hilbijartin û niha jî wek cîgirê şaredar hatim hilbijartin. Ez her tim di nava civaka xwe de bûm û bi awayekî aktîf beşdarî çalakiyên civatê bûm. Bi endambûna meclîsa şaredariyê ez ê çêtir xizmeta civaka xwe bikim.

Peyama min ji bo gelê Kurd û ciwanên civakên me ev e; di her sektora ku hûn lê bin de çi ji destên we tê bikin û dema xwe ji bo baştirkirina xwe û civaka xwe bikar bînin, gelên bindest jibîr nekin, xwedî li mafên  mirovan derkevin. Koka xwe jibîr nekin. Her tim li hêla gel bin û bibin endamekî berhemdar yê taxa xwe, civata xwe û civaka Brîtanî. Berjewendiya civakê bixin pêşiya berjewendiya xwe.










# ROZA SALIH YEKEM PENABERA HILBIJARTÎ LI ŞAREDARIYA GLASGOWÊ

HEVPEYVÎN
**EROL BASAK**

**■Ez te pîroz dikim beriya her tiştî. Tu bi malbata xwe re wek penaberekê hatî û we xwe sipart vî welatî. Ez dixwazim çîroka te hîn bibim. Hûn kengî û çawa hatin?**

Ez di 12 saliya xwe de tevî malbata xwe hatim vî welatî. Malbata min li Kurdistana Iraqê (Başûr) beşdarî siyasetê bûbû û ji ber sedemên ewlehî û emniyetê malbata min biryar da ku welatê xwe biterikînin û xwe bispêrin Skotlandê. Em jî wek gelek penaberên din li ewlehiyê digeriyan û me xwe gihand vir.

**■Te xwendina xwe hemû li Scotlandê temam kiriye? Te çi xwend li zanîngehê?**

Di sala 2013an de min li zanîngeha Strathclyde beşa Hiqûq û Siyasetê BA qedand.

**■Tu beriya ku bibî siyasetmedar aktivîsteke mafên mirovan î. Hêj di 15 saliya xwe de te Glasgow Girls damezrand. We gelek karên baş jî kirine. Dikarî ji me re hinek behsa Glasgow Girlsê bikî? Çi ye û ji bo çi we ev kom ava kiriye?**

Min di 15 saliya xwe de bi hevalên xwe yên dibistanê re Glasgow Girls/Keçên Glasgowê damezrand. Yek ji hevala min Agnesa danê sibê ji aliyê Karbidestên Koçberiyê ve ji mala wê hate hildan û hat binçavkirin ku ji bo Kosovayê were dersînorkirin. Glasgow Girlsê bal kişand ser muameleya li penaxwazan li Brîtanyayê, hişmendiya civakê bilind kir û dawî li girtina zarokan li Brîtanyayê anî. Bi saya kampanyaya me gelek malbatan, malbata min jî tê de, efû wergirtin. Kampanyaya me ewqas serkeftî bû ku me di sala 2005an de xelata salê ya kampanyaya Siyasetmedaran û Xelata Dianayê wergirt.



**■Ji aktivîstiyê te berê xwe daye politikayê. Û tu berê jî bûyî namzet û îsal di hilbijartina 5ê meha Gulanê de cara yekem hatî hilbijartin. Dikarim bipirsim gelo çima politika? Û çima Scottish National Party?**

Piştî Keçên Glasgowê ez ji siyasetê bêtir agahdar bûm û min dît ew çawa bandorê li jiyana me ya rojane dike. Di sala 2014an de ez wek xwendekar beşdarî referandûma serxwebûna Skotlandê bûm û min xwendekaran teşwîq kir ku xwe qeyd bikin û deng bidin. Vê yekê bala min kişand ser Partiya Neteweyî ya Skotlandê (SNP) û ez bûm endam.

**■Ji bo 4 salan tê li Councilê kar bikî. Sîstemeke çawa heye li Scotlandê?**

Ez kêfxweş im ku bibim endama meclîsê û vê dawiyê wekî Bailie hatim tayînkirin ku nûnertiya bajarê xwe Glasgowê bikim. Gelek meclîsên me hene û her meclîsek ji bo komîteyên cuda tên hilbijartin ku dê dema xwe li ser mijarên taybet ên wekî tenduristî, perwerde, xebatên civakî û hwd. vediqetînin...

Ez ji bo çend komîteyan hatim hilbijartin û yên sereke jî bihêzkirina civakê û veguhestin e.

**■Baş e hedefên te çi ne? Çi xizmetan tu dixwazî bikî? Dikarî ji me re hinek behsa projeyên xwe bikî?**

Ez ji hêla gelê Greater Pollok li Glasgow ve hatim hilbijartin, ji ber vê yekê ez dixwazim ji vê civakê re xizmetê bikim û heke pirsgirêkek wan hebe alîkariya wan bikim. Ez dixwazim bi ciwanan re tevbigerim û meclîsên civatê yên di wargeha xwe de bi hêz bikim.

Di beşa min de pirsgirêkên veguhestinê hene û ez dixwazim veguhestina gelemperî baştir bikim.

**■Wek aktivîstekî ji bo Kurdan û Kurdistanê jî xebatên te hene. Tu çûyî Bakur jî. Ji vir şûnde jî ev xebatên te ji bo Kurdan dê bi çi şiklê berdewam bibe?**

Ez li Kurdistanê hatime dinyayê û bi mîrateya xwe serbilind im. Ji bo doza mafên gelê Kurd çi ji destê min bê ezê bikim. Wek hûn jî dizanin ez çûme Kurdistana Bakur. Min raporek li ser asta binpêkirina mafên mirovan li Tirkiyeyê nivîsand û ev yek bi rêya sendîka û rêxistinên cuda belav kir. Niha ez endameke encumenê me û xelk jî dizane ku ez li Kurdistanê hatime dinê. Ev bi serê xwe destkeftek e ku cîhan jî nasnameya min a Kurdî dizane. Di paşerojê de ez hêvî dikim ku Glasgowê bi yek ji bajarên Kurdistanê ve girê bidim. Xewna min ev e.

**■Kişf e ku tu keçeke kurdewar î. Lê ez dixwazim hinekî te nas bikim, tu xwe çawa terif dikî?**

Ez şanaz im ku Kurd im û li Kurdistanê ji dayik bûme. Lê ez serbilind im ku Skotlandî û Glaswegiyanî me jî. Ez bi amadekarî, siyaset û nûçeyan re eleqedar im.

**■Ji bo bajar û welatê ku tu aniha lê dijî çi dikarî bêjî? Li ba te cihê wan çi ye?**

Ez ji bajarê Glasgowê hez dikim ku ez hewandim. Min xwendina xwe li Skotlandê qedand û li vir hevalên hêja peyda kirin. Ez spasdar im ji bo derfeta ku vî welatî daye min û spasdar im ji bo piştgiriya mezin a ku min standiye da ku ez bigihîjim cihê ku îro lê me.

**■Weke keçeke Kurd a serkeftî peyama te ji bo ciwanên Kurd û nexasim ji bo keçan dê çi be?**

Hûn kî bin bibin ew kes û ji bo baweriyên xwe berxwe bidin, her çend carinan ew bi zehmet û dijwar be. Di doza xwe de bi israr bin û pêbawer bin, ger hûn dev jê bernedin hûn ê bigihîjin tiştê ku hûn dixwazin. Ger we cara yekem çênebe, dîsa biceribîne.

**■Ji xeynî van, tiştekî tu bixwazî lê zêde bikî heye gelo?**

Spas ji bo vê derfetê. Ez hêvî dikim ku min keçên ciwan li her deverê teşwîq kiribin ku bi xwe bawer bikin.

Birêz Roza Salih wek Kurdekî ez te ji dil û can pîroz dikim û bi xebatên te jî serbilind im. Ji bo vê hevpeyvînê jî gelek spas dikim.







# 11. FESTÎVALA ELEWIYAN LI BRÎTANYAYÊ

THE HALL KURDÎ





Federasyona Elewiyên Brîtanyayê cara 11an festîvala Elewiyan li dar xist. Festîval 29ê meha Gulanê destpê kir û heya 5ê meha Hezîranê dewam kir. Di çarçoveya festîvalê de panelên bawermendiyê û pêşangeh hatin sazkirin, şano hatin lîstin, cem hate kirin û di 3 rojên dawiyê de jî li qadeke fireh konsertên hunermendan pêk hatin. Ji Tirkiyê, Brîtanya û Ewropayê gelek hunermendan di festîvalê de konser dan.

Festîvala îsal bi dirûşma aştî û edaletê hate sazkirin. Ji seranserê Brîtanyayê û Ewropayê zêdetirê 50 hezar kes hatin festîvalê.

Hevseroka Federasyona Elewiyên Brîtanyayê Dîlek Încedal got bi mehan me haziriya vê festîvalê kir.

Festîval bi coşeke mezin berdewam kir. Daxwazeke mezin a gelê me ji bo vê festîvalê hebû. Di dîrokê de xelkê Elewî gelek caran rastî komkujiyan, tede û îşkenceyan hatin. Em wana her tim bibîrtînin lê em zêde behsa destkeftin û serfiraziyên xwe nakin. Çimkî her çiqas li welatê me qedexe be jî li vir Elewîtî wek baweriyeke azad tê nasîn. Di vê çarçoveyê de festîvaleke pir xweş û coş pêk hat.

Hevserokê Federasyona Yekitiyên Elewî yên Ewroyê Hûseyîn Mat ji bo The Hall Kurdiyê got ev festîval ji bo wan gelek girîng bû.

Heval û canên me yên li Brîtanyayê bi salan e bi îstîkrar vê festîvalê lidardixin. Lazim e êdî Elewî ji bo pîrozkirina şahî, destkeftin û serkeftinên xwe jî bêne ba hev, di festîvalan de bigihên hev, govend bigerînin, stranên xwe bêjin. Ev festîval van peyaman dide. Ev kêfa me tîne û wek rêvebir ev yek me motîve dike.

Hunermenda Kurd û Elewî Suna Alanê jî di festîvalê de konsertek da. Suna Alanê dest nîşan kir ku ew şanaz e ku perçeyeke vê festîvalê ye.

Ez gelek şanaz im ku wek hunermedeke Kurd û Elewî û jin beşdarî vê festîvalê dibim. Çimkî Elewî gelek qedrê jinan digrin. Û par festîval online hatibû kirin û diyarî jinan hatibû kirin. Ez bi kêfxweşî tê de cî digrim. Festîval bi coşeke mezin çêdibe. Piştî pandemiyê em dibînin eleqeyeke mezin heye. Elewî xwedî li nirx û çanda xwe derdikevin. Ji ber ku ez jî perçeyekê vê yekê me gelek dilşa me.

Sernava festîvala îsal aştî û edalet bû. Hevserokê Federasyona Elewiyên Brîtanyayê Mûslûm Dalkiliç sedema bijartina dirûşmeya aştî û edaletê wiha bilêv kir.

Li welatê me mafên mirovan tê binpêkirin, heq tên warin, girtiyên nexweş nayên berdan, siyasetmedarên Kurd û Elewî bi salan e li

hepsê ne û mahkemeyên wan temam nabe an jî naxwazin temam bikin. Nabe ku civaka Elewiyan ji van neheqiyan re bêdeng bimîne. Lê rêveberiya zalim a li Tirkiyeyê naxwaze em bi meseleyên li welêt re eleqedar bin an mudaxîl bin. Ji loma jî ew ji me nahewin. Gava rêvebir û endamên me diçin Tirkiyeyê li balafirgehan têne binçavkirin. Serokê me yê berê Îsrafîl Erbîl hate binçavkirin. Turgut Eker bi salan e tê darizandin. Reveberên me yên li Belçîkayê her ku diçin Tirkiyeyê têne binçavkirin. Lê em ê hûş nebin.

Li gorî amarên jimartina nifûsê ku par hate kirin, li Brîtanyayê dora 300 hezar Elewî hene. Hevserokê Federasyona Elewiyên Brîtanyayê Dalkiliç dibêje ew gelek birêkxistin in û bi hev re hereket dikin.

18 cemxaneyên me hene li Brîtanyayê. Ji xeynî van gelek komeleyên gundan û saziyên sivîl hene li vir. Em hemû bi hev re tevdigerin. Roj bi roj em zêdetir dibin û birêkxistin dibin. Yekem cemxane di sala 1993an de hatiye damezrandin. Di 10 salên dawiyê de me 17 cemxane vekirin. Em dixwazin bigihên hewcedariyên civaka xwe.

Hevserokê Navenda Çanda Elewiyan û Cemxaneya Îngilîstanê Ibrahim Has jî behsa destkeftinên Elewiyan kir û got hebûna Elewiyan li Brîtanyayê digihê dora 30 salan lê ew niha li gelek şaredariyan têne temsîlkirin.

Di hilbijartina herêmê ya meha çûyî de gelek destkeftinên me çêbûn. Wek mînak di şaredariya Enfîeldê de serok û cîgir ji civaka me ne. Dîsa li Harringay, Hacney, Islingtonê û li çend şaredariyên din em têne temsîlkirin. Wekî din li parlamentoya Brîtanyayê caneke me ya Jin, Kurd Û Elewî Feryal Clark heye. Herwisa bi hewl û xebatên me li parlamentoyê sekreteryaya Elewiyan hat avakirin. Ev hemû destkeftin di demeke kin de pêk hatin. Û ev festîval jî nîşanî me da ku heke em vê yekîtî û bihevrebûnê biparêzên dê her kes li her derê mecbûr be me cidî bigre. Jixwe weke rêveber armanca me ew e ku em Elewiyan û Elewîtiyê bidin xuyakirin. Hem ji hêla siyasî, hem ji hêla aborî û hem jî ji hêla civakî ve. Lewra em dibên Elewîtî heye û heq e.










# GERNAMEYA YÛNANÊ

NECAT ZIVINGÎ

Çi cara derfetê dibînim bi rêyan dikevim.
Yan jî rêya min pê dikeve.
Vê carê Yûnanistan e:
silav Elláda! γεια σου ελλαδα!

***“Lêkin tu bibêje ew çi esl in***
***Qenc keşif bike ku ew çi nesl in”***
*Mem û Zîn*



Welatê ku li Tirkiyeyê jê re Yûnanîstan dibêjin, ne Yûnanistan e. Bi navê xwe yê fermî Ellada (Hellás); yanî Komara Helenê ye. Di zimanên rojavayê Ewrûpa de jî (Ingilîzî, Frensî, Elmanî) jê re Grek tê gotin.

Peyva Yûnanê ji Îyonya tê. Îyonyaya dîrokî yanî Yûnana rastîn herêma Egeyê ye. Tirkan dîsa ya xwe bi me kirine; nav guherandine. Bila tim di hişê we de be; agahîyên tirkan bi giştî bêbingeh, pûç û polîtîk in.

Nifûsa Ellada 10 milyon e. Cîranê Albanya, Makedonya û Bulxarê ye. Bi deryayên Ege, Îyon, Girît û deryaya Sipî dorpêçkirî ye.

Yûnanistan, di 1460î de ji alîyê Osmanîyan ve hatîye dagirkirin û 400 salan di bin desthilata Osmanîyan de maye. 16 sal piştî şoreşa Frensayê, di sala 1814an de li bajarê Odessa ya Ukraynayê hinek bazirgan û rewşenbîrên Yûnanî bi navê Fîlîkî Eterya bi rêxistin dibin û tevgera azadîya Yûnanîyan di 1821ê de li girava Morayê dest pê dike. Elladaya îro, di 1832yan de hatîye damezrandin. Mîna Yûnanê, welatên bi sedsalan di bin desthilata tirkan de mane û piştre serxwebûna xwe bi dest xistine pir in: Sirbistan 539 salan, Xirwatistan û Makedonya 539 salan, Slovenya 250 salî, Romanya 490 salî, Macaristan 160 salî, Gurcistan 400 salî, Albanya 435 salan, Bulxaristan 545 salan, welatên Ereban yên wek Urdun, Erebistan, Yemen, Behreyn, Lîbya û Misirê jî derdora 400 salî…

Ji ber Yûnana antîk dergûş û wargehê felsefe û şaristanîya îro ya pêşketî ye; tim di bîra min de û xwezîya min bû; ku li Yûnanê bigerim. Her çiqas nêzîk be jî; lê hinek tişt tim li benda wextê xwe ne. Gera min a Yûnanê jî yek ji wan bû. Weke pirên gerê min, ev jî ne bi plansazîyeke tûrîstîk pêk hat. Gelek caran karek yan jî hevalek dibe sedem û derî li ber min vedibin. Ev jî wisa bû. (Wek têbinî; gerên min bi giştî ne tehtîl û betlane ne. Û bi pereyekî pir pêk nayên.)

**Korfû**

Gera min ji bakurê Yûnanê, ji giraveke nav deryaya Îyonê dest pê kir: Korfû (Kérkyra). Li giravê 2 kelih hene. Bi taybet yek ji wan pir asê û zexm e. Bi her awayî ji bo parastinê hatîye dîzaynkirin. Heya niha li hemtayê wê rast nehatime. Li hember dîwarên wê yên bilind û xelekên wê yên parastinê yên di nav hev de, heyirî mam. Tenê ji bo dîtina wê kelehê be jî çûyîna Korfû hêja ye.

Osmanîyan ji bo wê gotine; Korfoz (Körfez) û di serdema herî xurt ya Siltan Silêmanê Qanûnî de (1537) bi 50 hezar leşkerî girav dorpêç kirine; lê bi ser neketine. Di sala 1716an de cara duyem dorpêç kirine; lê dîsa têk çûne.





Korfû di dîrokê de wek qufleya Adrîyatîkê hatîye dîtin. Ji bilî Yûnanîyan; Roma, Bîzans û Venedîkê li giravê hikum kirine. Desthilata Venedîkê 400 salî (1386-1797) domîyaye.

Çanda giravê têkil e. Bandora Îtalî, Ingilîzî û Albanîyan zêde ye. Lewma ne giraveke klasîk ya Yûnanê ne.

Her çiqas hewa baş ne germ bû jî, lê li ber dîwarên bilind ên kelihê min dest bi sezona avjenîyê kir û ketim avê.

**Îoannîna (Yanya)**

Yek ji bajarên herî mezin yê Yûnanê ye. Wateya Îoannîna; "Bajarê Yehya" ye. Di navbera 1431–1913an de di destê Osmanîyan de maye. Jixwe ji mizgefta biçûk ya hundirê kelê dîyar e. Bajarekî pir çandî ye. Keliha wê gelek fireh û mezin e. Gol û sirûşta bajêr seyrangehên bijarte ne. Gera li kêleka golê û hundirê kelê, mîmarîya kolan û avahîyan, jîyana şevê; çêjeke taybet bi mirov re dihêle. Heya niha min tenê li deverekê tiştekî xwe ji bîr kiriye; ew jî ev der bû. Yekî din li odeyê bû… Îşlik û tîşortê min li wir ma.

**Meteora**

Di gera Yûnanê de devera herî fantastîk. Li kêleka Çîyayên Pîndos, li jor Kalabaka û Kastrakî… Hê ji dîmenan dîyar bû ku pir cuda ye. Rêyên nav daristanê, rêwîtîya ligel xezalê, keşîşxaneyên li lûtkeyên bilind, bendewarîya roavabûnê li wî asîmanî…

Wateya Meteora "Daleqandî" ye, jixwe Zivinga me jî "Daleqandî" ye. Lewma destê me jê nebû û em du roj û du şevan li wir bûn mêvan. Herdu rojan jî em baş meşîyan û baş hilkişîyan.

**Delfî**

Piştî Meteora em derbasî Trîkala bûn û ji wir çûn Atînayê. Termînala payîtext weke termînala gundan bû. Ji bo keşfa bajêr me got em bimeşin û li wan kolan û taxên paşvemayî rast hatin. Wê şevê me xwarineke xweş xwar û li mala hevalekê bûn mêvan. Roja din serê sibehê berê me li Delfîyê bû.

Delfî, bi nivîsa li ser derîyê Perestgeha Apollon navdar e: Xwe bizane (Gnothî seauton, γνῶθι σεαυτόν). Yûnanî vê derê wek "navika cîhanê" bi nav dikin. Ev der navenda gerdûnê ye. Kevirê Omphalos li vir e. Agirê bêdawîtîyê li vir pêketî bû.



Dîyar bû ku navendbûneke vê deverê heye. Her wiha seyrangeheke xweş e. Em li bajarê antîk û mûzexaneya bajêr gerîyan û ber êvarê vegerîyan.

**Girava Aegîna**

Roja din, bi ferîbotê me berê xwe da girava Aegîna. Di mîtolojîyê de Aegîna (Egîna) keça xwedawendê robaran Asopos û nymph Metope ye. Zeûs ew revandîye û biriye girava ku navê xwe ji Aegîna wergirtîye. Hera, dema ev bihîstîye ji dexesîyê gelê giravê tune kiriye. Zeûs jî girav kiriye navenda artêşa Myrmîdon.

Meşa li kordonê, temaşeya deryayê û çîyayên li pişt wê, gera li perestgeh û dêrên sedsalan xweşîyên vê giravê bûn.

**Atîna**

Me rojên xwe yên dawî jî li Atînayê derbas kirin. Dirba bajarekî Ewrûpayê bi Atîna nakeve. Mîmarîya bajêr ne estetîk e û trafîk pir e. Tenê li Monastrakî hinekî bêhna mirov derdikeve. Baş e Akropolîs heye.

Bajarên Yûnana antîk li derdora Akropolan ava dibûn. Perestgeh û dezgehên dewletê li van Akropolên bilind bûn. Akropola Atînayê, li cîhanê ya herî navdar e. Berya Zayînê di 3000î de ava bûye. B.Z di sedsala 5an de Perîkles ew bi pêş xistîye. Atîna bi vê dîrokê xweş bajar e… Pir xweş bû, temaşeya bajêr, ji wê bilindahîyê…



Mirov here Atînayê û zanayekî weke Ali Karduxos jî nebîne nabe. Di sohbeta wî de zewqa felsefeyeke hûr û kûr heye. Ji bo me Kurdan hêjayîyeke bijarte ye. Pêwîstîya me bi vê awirê heye. Bi sohbet û mazûbanîya wî rûmetdar bûm.

Yûnan, ne welatekî pêşketî ye. Ew jin û mêrên di peykeran de ne xuya ne. Lê dîsa jî mîtolojîya Yûnanê û dastanên Homeros li derdorê ne. Yûnanî, hê jî nanê wan dixwin.

Dîmenên kolan û jîyanê, ji yên tirkiyeya xopan zêde ne cuda ne. Lê ya herî girîng; li derveyê tirkî 1, ne yek (1) e. Me xwarineke xweş bi 9-10 Euroyan dixwar. Bihaya otêlan bi giştî 30-40 Euro bû. Lê kambax be ku bi pereyê tirkî matematîk jî serobino dibe.

Dîsa jî ger xweş e. Hewaguhêzî tendurustî ye. Rê dikemilîne; hevrê dixemilîne. Vê carê di miraq û çelengîyê de em hemtayê hev bûn… Îcar dawî li gerê nayê. Mîna xwarinê; têrbûn tune ye, beskirin adet e. Xweş gotin e: Dum vivimus vivamus. Hê em li jîyanê ne, bijîn.





# MERYEM XAN
## DENGBÊJA HIZIN Û KEDERÊ

MELEHAT ULUÇ AKINCI

Derbarê jiyana Meryem Xanê de her çiqas çavkaniyên berfireh kêm bin, pêzanînên heyî jî ji hev cuda ne. Di serî de derbarê cihê ku Meryem Xanê lê ji dayik bûye û neseba wê de çavkaniyên cur be cur derdikevin pêş.

Li gorî hin zanyariyan hunermend Meryem Xan xelkê Cizîrê ye, li gundê Dêrgulê ji dayik bûye, bi ser qezaya Bêrtiyê ve ye. Li gorî zanyariyek din ku ev zanyarî ji aliyê malbata Meryem Xanê ve hatiye neqilkirin Meryem Xan ji navçeya Basaya (Güçlükonak) Şirnexê ji gundê Kêrxwerê (Demirboğaz) ye.

Meryem Xan di sala 1904an de ji dayik bûye. Keça Heciyê Hemo ye. Rewşa aborî ya malbata wê baş bû. Malbata wê li gundê Kêrxwerê bi ajeldariyê ve mijûl bû. Bavê Meryem Xan Heciyê Hemo li herêmê yekî bi qedr û qîmet bû. Sê zarokên Heciyê Hemo çêbûne. Yek jê Meryem Xan yên din Huseyn û Yehya ne.

Piştî ku dê û bavê Meryem Xan diçin ser dilovaniya xwe Meryem Xan diçe Kerboranê û ji gundê Zivingê yekî bi nav Xelîl Înan re dizewice. Lêbelê zewaca wan zêde dewam nake û hevdû berdidin. Lewra Meryem Xan dixwaze xeyala xwe ya dengbêjiyê bibe serî û di vî warî de pêş bikeve. Ji bo vê daxwaza xwe her çiqas ji hevserê xwe re dibêje ez bêyî kilaman nikarim bijîm jî wî qanî nake.

Êdî Meryem Xan ji bo vê daxwaza xwe ya dengbêjiyê her



tişt dide ber çavên xwe û daxwaza hevserê xwe ya hevberdanê qebûl dike. Piştî vê Meryem Xan xwe bi temamî dide hunerê û diçe Mûsilê. Li Mûsilê dibihîze ku kompaniyên mûzîkê yên Îngilîz li Bexdayê stran û kilamên Kurdî, Farisî û Ermenîkî berhev dikin û sêlikan (plak) saz dikin. Ev ji bo Meryem Xanê dibe firsendek, Meryem Xan digihêje miraza xwe û weke yekem jina Kurd bi zaravayê Kurmancî sêlikekê tomar dike.

Di sala 1939an de radyoya Bexdayê dest bi weşanê dike û ji bo ku hunermendên bikadroyî bigire di sala 1944an de pêşbaziyekê li dar dixe. Gelek dengbêj û stranbêj beşdarî vê pêşbaziyê dibin, lêbelê Meryem Xan bi sewt û awaza xwe dibe yekemîna vê pêşbaziyê. Êdî heta dawiya emrê xwe weku hunermendeke kadroyî di radyoya Bexdayê de dixebite.

Meryem Xan, piştî ku di radyoyê de dest bi kar dike ji bo çand û kelepora Kurdî bê sekin dixebite. Gund bi gund digere û kilamên ku li ber wendabûnê ne wan berhev dike û tomar dike. Bi vî awayî arşîvek baş a kilamên Kurdî çêdibe. Li gorî agahiyan Meryem Xan di seranserê jiyana xwe ya hunerî de nêzî du sed kilam strane.



Lêbelê ev kilam ji ber ku amûrên radyoyê yên tomarkirinê tunebûn di arşîvên radyoyê de nehatine parastin. Ji bo vê yekê pir kêm kilamên wê gihaştine heta îro. Ev kilamên li ber destan jî ji 44 aliyê hin lêkolîner an jî hunerhezan ve hatine berhevkirin. Ji bilî radyoya Bexdayê di radyoya Erîwanê de jî deng û kilamên Meryem Xanê hatine tomarkirin.

Meryem Xan di temenekî ciwan de bi nexweşiya gurçikê dikeve. Nexweşiya wê dibe sedem ku Meryem Xan xwe ji her tiştî dûr bixe. Meryem Xan di sala 1949an de li nexweşxaneya Mîr Îlyas diçe ser dilovaniya xwe. Li Bexdayê bi merasîmekê li goristana Şêx Marûf tê definkirin. Dengbêj Mihemed Arif Cizrawî, Hesen Cizrawî, Nesrîn Şêrwan, Elmas Xan, Elî Merdan û xebatkarên radyoya Bexdayê û ji nav gel jî gelek kes beşdarî merasimê dibin.

**HUNERMENDIYA MERYEM XAN**

Meyrem Xan, di tradîsyona dengbêjiya Kurdî de cihekî girîng digire. Weke dengbêj Reso, Şakiro, Mihemed Arîf Cîzrawî, Hesen Cîzrawî û Nesrîn Şêrwan ji bo hunera Kurdî kedek mezin daye. Bi berhevkirinên kilamên Kurdî ji bo radyoya Bexdayê hişt ku îro nifşên nû hay ji çand û kelepora xwe hebin. Bi sewt û awaza xwe wê jî weke gelek dengbêjan navê xwe li dîrokê nivîsî.

Her dengbêjek şêwazekî wî/wê heye. Meyrem Xanê jî bi şêwaza xwe û cureyên kilamên xwe ji dengbêjên din vediqete. Lê di bingeha hemû kilamên dengbêjiyê de em rastî realîteyên civaka Kurd tên. Dengbêjan evînên ku hatine jiyin, koçberî, şer, mirin, bûyerên dîrokî, bûyerên civakî û hwd. kirine kilam û ji bo nifşên nû ev kilam bûne weke belgeyên dîrokî.

Dengbêj tiştên bihîstine, dîtine yan jî bûne şahid bi kilamên xwe ew gihandine heta roja îro. Dema em li kilamên Meyrem Xanê dinerin evînên ku li ser erdnîgariya vî welatî deng vedane ku weke kilama “Çemê Bişêrîka Şewitî” û yên din, bûyerên dîrokî weke “Bavê Koroxlî”, “Bişarê Çeto”, evîna xwe weke kilama “Mihemedo Ronî”, li ser tenêtî, xerîbî, koçberî û hwd. gelek qewimîn ji xwe re kiriye mijara kilaman yan jî kilamên bi vî rengî ji xwe re hilbijartiye û strandiye. Dikare bê gotin ku hemû kilamên xwe bi dengekî hizin straye. Ev jî li gorî baweriya me ew bûyerên ku hatine serê wê karîgerî li ser dengê wê jî kiriye. Jixwe temaya kilamên wê bêtir hizin e. Weke nimûne em dixwazin li ser analîza kilama “Çemê Bişêrîka Şewitî” ku yek ji kilamên hizinê ne rawestin.

“Lê lê yadê rebenê wez ê çûme çemê Bişêrîka şewitî
Ax dayê rebenê wez daketim, oy gewra min tu yî lê ay ax
Oy sebra min tu yî, lê de lê lê ax de lê lê ay ay ay ax
Lê lê yadê rebenê, dibê xewka min tê vê sibê wez raketim way ax
Lê lê wez ê çi qa nav heval û hogirê xwe da bilind firîm
Ax dayê rebenê wez ê nizim bi erdê ketim
Ay gewra min tu yî lê ay ay ax
Oy sebra min tu yî lê de lê lê ax de lê lê
Lê lê wez ê tobedara şêxê xwe me lo ax
De wez ê ji navekî(?) bedew ez ê bejna lawikê xwe me
Ax ax de lê lê ax de lê lê, ay ay ax
Lê lê yadê rebenê keçikê digo wez koçer im ax
Ax dayê rebenê penîr tînim, oy gewra min tu yî
Lê ay ay ay ax ay sebra min tu yî lê
De lê lê ax de lê lê, ay ay ay ay
Lê lê yadê rebenê wez ê kolan bi kolan vê sibê digerînim ax
Lê lê wez ê çiqa çavê xwe digerînim nagerînim
Ax wez ê bejna bilind li nav wa bajara nabînim ax gewra min tu yî lê
Ay ay ay ax ax oy bermaliya min tu yî lê de lê lê
Ax ax de lê lê, ay ay ay ay ax ax”

Ev kilam li ser evîndariyê ye. Ji bo vê yeke cureya vê kilamê lîrik e. Temaya wê negihandin, bêrîkirin, bêmirazî, tenêtî û hizna evînê ye. Kilameke herêma Xerzan e. Ev kilam ji devê jinekê hatiye girtin. Em dikarin weke lawij jî bi nav bikin. Ji ber ku gotinên dilşewat ên jinê ne. Di kilamê de keçik ji diya xwe re behsa bêrîkirina evîndarê xwe û êşa dilê xwe dike.

Kilam heta dawiya wê bi gazina ji çarenûsa xwe ya keçikê dewam dike. Hêjayî gotinê ye ku ev evîna keça koçer Nafya, evîneke platonîk e. Çimkî haya Emînê Ehmed ji vê evînê tune ye û çênabe jî.

Ev kilam weke ku dengbêj Salihê Qubînî jî dibêje, ji devê keçeke mihacir hatiye girtin. Dengbêj ji devê keçikê bêçarebûna wê ya li hember eşqeke mezin ango qêrîna wê daye bihîstîn. Keçik hemû derdê dilê xwe bi diya xwe re parve dike. Xwe spartiye diya xwe. Bangî diya xwe dike ku diya wê jê re çareyekê bibîne.

Lewre, evînê zora wê biriye. Motîva “reben”ê ku keçik bi vî awayî bang li diya xwe dike, tê vê wateyê ku keçik tevî ku dizane tu tişt ji destê diya wê nayê jî dîsa jî xwe spartiye wê. Keseke reben; belengaz e, perişan e, tu tişt ji dest nayê. Lê, ji ber ku keçik pir dilşewat e û dizane ku tenê diya wê, wê fêhm dike hemû derdê xwe jê re dibêje.

Di kilamê de gotina “Bişêrîka şewitî” weke metaforekê hatiye bikaranîn. Ango, destnîşankirina ew cihê ku êdî jiyan lê ne pêkan e yan weke mecazî wêranbûn û xerabûna wî cihî ye. Çimkî, li gorî çîroka kilamê Emînê Ehmed li Bişêrîkê hatiye kuştin û veşartin. Êdî Bişêrîkê ji bo keça mihacir ne cihê jiyînê ye.

Wekî din em dikarin li ser motîva “koçer”ê bisekinin. Lehenga kilamê keçeke koçer e, li xerîbiyê ye. Yanê hem êşa evînê hem jî êşa xerîbiyê keçik xistiye hizneke mezin. Di bangkirina li diya xwe de tenêtiya wê, jarbûna wê û êşa welatê xerîbiyê tê xuyakirin. Keça koçer Nefya diya xwe her tim weke sebra dilê xwe dîtiye û ew kiriye şirîka derdê xwe.

Ji kilamê xuya ye ku keça mihacir heta ji dest hatiye li dû evîna xwe çûye. Her çiqas çavên xwe digerîne nagerîne, kolan bi kolan digerîne jî bejna bilind ya hezkiriyê xwe nabîne.

Êdî keça koçer fêhm dike ku ev evîn naçe serî û ji hemû jiyînên xwe poşman dibe û tobe dike. Yanê ji kîjan aliyî vê em li vê rewşa keça koçer binêrin xembariyek, hiznek xwe dide der.

Di reseniya çîrokê de her çiqas karakterên reel û berbiçav hebin jî di vê varyanta kilamê de navên lehengan nayên gotin, lê bi awayeki nerasterast hatine teswîrkirin.



# PÎREMÊRD: HELBESTVANEKÎ PÊŞENG


ZÜLKÜF ERGÜN

Ji bo hemû neteweyan û bi taybetî ji bo Kurdan “bîr” tiştekî giring û jîyanî ye. Bi bawerîya min “bîra Kurdan” herî zêde di helbestê da hatîye parastin û demeke dirêj e ku helbestvanên Kurd bûne hilgirên bîra civakî, sîyasî û neteweyî ya gelê xwe. Lê ji Xanî û vir ve hin helbestvanên Kurd ne tenê veguhêzên vê bîrê ne, di heman demê da afirîner û geşepêderên wê ne jî.

Pîremêrd di serê sedsala bîstî da wek mîratgirê vê çandê xwe dide ber barekî weha girîng û giran û dibe yek ji xelekên bihêz û hêja yên vê nerîtê. Serdema jîyana Pîremêrdî serdema hilweşîna dinyaya kevin û avakirina dinyaya modern bû. Di 1867ê da dema li Silêmanîyê ji dayîk bû mîrektîya navdar a Babanî ji nav çûbû û dezgehên navendî yên Osmanî li vî bajarî hatibû danîn.

Pîremêrd herçend wek pêşîyên xwe di hucreyên mizgeftan da dest bi xwendinê bike jî ji wan cudatir di 1882yan da li Silêmanîyê wek kâtibe nifûsê dest bi kar dike û dikeve nav çerxên burokrasîya Osmanî. Ji ber vê çavnasîyê jî li gor sîyaseta Sultan Ebdulhemîdî dema Şêx Seîdê Hefîd ji bo paytextê tê vexwendin Tewfîqê ciwan yawerîya wî dike û berê xwe dide Stenbolê.


Yek ji dîyarîyên Sultan Ebdulhemîdê “bavê Kurdan” ji bo Şêx Seîdî û yawerên wî şandina wan a hecê ye ku dixwest bi rêya biratîya dînî rê li ber hişyarîya neteweyî ya Kurdan bigire. Piştî



vê geştê Tewfîq dibe Hacî Tewfîq, lê bi hacîtîyê tenê qayîl nabe û cihê ku vegere Silêmanîyê dîsa diçe Stenbolê. Bi xêra Farisîya xwe ya rewan û bi arîkarîya Îzet Paşayî dibe yek ji endamên Meclisa Alî, lê di ber da mekteba hiqûqê jî dixwîne û payeya begîtîyê werdigire.

Dema Şoreşa Meşrûtîyetê çêdibe (1908) êdî kesekî şareza û têgihîştî ye, loma jî wek Mûsayê di seraya Fîrewnî da perwerdebûyî, bi saya derfetên demkî û kurt ên vê şoreşê rexne li zordestîya berê digire û mizgîna serdemeke nû dide Kurdan. Ji ber vê wek rêvebir û xwedî îmtîyazê *Rojnameya Arîkarî û Pêşketina Kurdan* (Kürt Tevavün ve Terakki Gazetesi) di nivîsara yekem a vê rojnameyê da ji alîyekî ve behsa serdema reş û tarî ya raborî dike ji alîyê din ve rê dide ber hevregezên xwe, da ku ew jî mîna miletên din bigihîjin hevtayên xwe.

Mixabin piştî demeke kurt zordestîya nû ya Îttîhad Teraqîyê cihê zordestîya kevin a Sultanî digire û mîna gelek hevalên xwe ew jî di 1909ê da digel Bedîuzemanî dikeve zindana tarî ya serdema nû. Lê di serdema Osmanî da celatkirin ne tenê bi rêya zindanê, bi rêya dûrxistinê jî dihat kirin. Loma jî piştî ku wî ji zindanê derdixin bi erka qaymeqamtîyê berê wî didin Colemêrgê da ku ji paytextê dûr bikeve û nekare ji wan ra sergêjanîyê çêbike. Ji ber vê bi dorê li Colemêrg, Beytuşebab, Adapazarî û Amasyayê wek burokratekî payebilind kar dike.




Tevî vê erkdarkirina mebestdar jî bi rêya nivîsarên xwe yên di çendîn kovar û rojnameyên Kurdî, Tirkî û Farisî yên mîna *Jîn, İctihad, Serbestî, Resimli Kitap, Mussavver Muhit, İkdam, Hurriyet, Şems, Ferheng, Şefeqî Sorxê* da raya xwe derdibire û bi naznavên Suleymanîyelî Tewfîq, S.T. û Pîrê Kurd ji bo sûda giştî ya neteweyî bîr û boçûnên xwe belav dike.

Bi avakirina Komara Tirkîyeyê êdî li pêşîya kesên mîna wî du rê dimînin: Yan vegera welatî yan jî rojîya bêdengîyê ya mîna serdema Sultan Ebdulhemîdî. Ew, rêya vegerê dide ber xwe, di 1924ê da jina xwe û du kurên xwe li dû xwe dihêle û bi hêvî û xewnên mezin berê xwe dide Silêmanîyê. Pîremêrd tevî ku di burokrasîya Osmanî da gihîştibû pileyeke bilind û di dewleta nû ya Îraqê da bi hêsanî dikarî pileyeke bilind bi dest bixe jî wek rêçika xwe ya qelenderî pişta xwe dide payeyên demkî û ji 1925ê heta mirina xwe (1950) bîst û pênc salan li Silêmanîyê hîmên bihêz ji bo geşkirina çand û merîfeta Kurdan datîne.

Di 1926ê da bi avakirina Komeleya Zanista Kurdanê (Cemîyetî Zanistî Kurdan) digel hevrêyên xwe bernameyeke perwerdekirin û ronakbîrkirineke berfireh dide ber xwe ku ji weşandina kovar û rojnameyan heta wergêrana pirtûkên bîyanî, vekirina pirtûkxaneyan, şandina xwendekaran ji bo derveyê welatî, perwerdekirina gelî bi dersên şev û rojê pêk tê (1926: 8). Di bicihkirina vê bernameyê da Pîremêrd yek ji stûnên sereke yên Zanistîyê ye û mirov dikare bibêje bi rêya zarokên Zanistîyê ruhekî neteweyî û pêşketinxwaz li Silêmanîyê belav dike.

Pîrozbahîya cejna Newrozê dibe sembola herî giring a vî ruhî ku Pîremêrd vê nerîta kevin a kurdewarî ya jibîrçûyî bi gîyanekî neteweyî û modern ji nû ve vedijîne û bi nivîsîna newroznameyan û gêrana cejna Newrozê atmosfera bajarê Silêmanîyê diguherîne. Bi saya vê keda wî çend sal paşê ev ruh li hemû welatê kurdewarî belav dibe û Newroz wek cejneke neteweyî êdî li her cihî tê pîrozkirin.

Ji bo çêkirina keşûhewaya cejnê Pîremêrd her sal bi derfetên xwe yên madî yên berteng şîranî û pêwîstîyên cejnê bi ser mirovan da dabeş dike, cilûbergên Kurdî bi şagirdên Zanistîyê dide liberkirin, wan tîp bi tîp rêz dike û bi xwendina sirûdan berê wan dide Girê Mame Yareyê. Li vir jin û zilam, keç û kurên bajarî kom dibin, bi stran, sirûd, govend, dahol û zirneya kurdewarî ahengeke bi coş û xiroş li dar dixin û ji bo bîrxistina çîroka mîtolojîk a Newrozê şagirdên Zanistîyê çîroka Dehaq û Kaweyê Asinger wek




şano nîşanî temaşevanan didin.

Ji bilî karûbarên Zanistîyê yek ji mijûlîyên sereke yên Pîremêrdî jî derxistina rojnameyan e. Ji ber vê ji 1926ê heta 1932ê di rojnameya Jîyanê ya şaredarîya Silêmanîyê da kar dike û di 1932ê da jî piştî Husên Nazim rojname bi tevahî dikeve destê wî û heta 1938ê bi sere xwe wê bi rê ve dibe, lê dema Mecîd Yakubê tûranî dibe walîyê Silêmanîyê dest datîne ser çapxaneya Jîyanê û nahêle Jîyan derkeve. Ji ber vê, Pîremêrd li ser hesabê xwe çapxaneyekê dikire û wek bavê zindîkirina nerîtên qenc, navê Jîna Stenbolê lê datîne û bi heman navî rojnameyeke nû derdixe. Bi vî awayî bi rêya Jîyan û Jînê dibe hilgir û parêzvanê bîr û marîfeta 25 salîya hemû kurdan û li ser dahênana xwe ya çandî berdewam dibe.


Pîremêrd ew çend giringî dide van her du xebatên xwe ku di wesîyetnameya xwe da jî navê wan hildide û dibêje li vî welatî du çavên min hebûn yek Zanistî û ya din jî Jîn. Lewra her duyan jî ji bo pêşxistina neteweya xwe wek du amrazên girîng dibîne û dema berê xwe dide derîyê ebedîyetê tekane derdê wî ew e ku qewmê xwe di pileyeke bilindtir, xwendewartir û pêgihîştîtir da bibîne. Vê daxwazê wek girêya dilê xwe dide zanîn ku jîyana xwe da bi çavê serê xwe nedîtîye, lê bawerîyeke wî ya bihêz bi nifşên paşerojê heye û ji dil bawer dike ku şîyana pêşketinê di keç û kurên welatê wî da heye û rêya vê jî di zanist û xwendinê da dibîne. Van risteyên xwe weku şîreta xwe ya dawî di wesîyetnameya xwe da dinivîse:

Pîremêrdê mezin dema mir li pey xwe gencîneyeke dewlemend hişt. Ji bilî arşîvên du rojnameyan (Jîyan û Jîn) dîwaneke helbestan, 6400 gotinên pêşîyan û metelokên honraweyî, sê şanoname (Mem û Zîn, Mehmûd Axay Şîwekel, Şerîf Hemewend), çar çîrok (Diwanzde Siwarey Merîwan, Awatî Dill, Encamî Piyawêkî Bengkêş, Zoremilê Milşikênî li Diwa ye), bîranînek (Dinyam Çon Dî), sê

wergeran (Romana Kemanjen a Hans Andersonî ji Tirkî, Dîwanî Mewlewî ji Kurdîya Goranî, Dîwanî Mewlana Xalidî jî ji Farisî), du berhevokên folklorê (Le Pendekanî Pîremêrd, Galte w Gep) û gelek nivîsarên rexneyî û gotar di kovar û rojnameyên curbicur da li dû xwe dihêle.

Divê neyê jibîrkirin ku di danîna çand û nasnameya modern a Kurdî da Pîremêrd hîmekî giring e. Kî dizane rojek ji rojan belkî mezinahîya vî xweşmirovî bi başî bê famkirin û heykelê wî li bajar û bajarokên kurdewarî bê danîn. Lê heta wê çaxê ez bixwe wek emanetekî pîroz dibînim ku peyama Pîremêrdê mezin li dil û mejîyên pak û ciwan bê nexşandin yan jî delîlî bê kirin ji bo nasandina wî û emsalên wî.





**ÇAVKANÎ**


Ergün, Z. (2017). *Nerît û Helbest.* İstanbul: Nûbihar.

Ergün, Z. (2018). Newroz û Cureyê Newrozanemeyê di Edebiyata Kurdî ya Nû de. *Dil Bilimleri (Klasik Sorunlar-Güncel Tartışmalar).* (330-345). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Pîremêrd (2001). Dinyam Çon Dî. U. Aşna (Kokirdnewe û Lêkollînewey), *Pîremêrd û Pêdaçûnewey Nwêy Jiyan û Berhemekanî* (Çapî Yekem, b. 1, r. 10-47). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.


Pîremêrd (2001). *Pîremêrd û Pêdaçûnewey Nwêy Jiyan û Berhemekanî* (Bergî Yekem) U. Aşna, (Kokirdnewe û Lêkollînewey). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.

Pîremêrd (2007). D*îwanî Pîremêrdî Nemir.* M. R. Hawar (Kokirdnewe û Perawêznûsîn). Zincîre Billawkirawekanî Çapxaney Şivan.

Tewfiq, S. (1998) Meqsûdî Kirdewebûnewey Cem'îyet. *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi.* M. Emîn Bozarslan (Amd.). Uppsala: Weşanxana Deng.

Xeznedar, M. (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî Bergî Pêncem.* Hewlêr: Çapxaney Aras.

Zarî Kirmancî (1926). Basî Kurdistan. *Zarî Kirmancî*. 1. 8.



# ATOM EGOYAN: DERHÊNERÊ NAVDAR Ê ERMEN

RÛMET MED





Derhêner, senarîst, çêker û lîstikvanê navdar ê Kenedayî Atom Egoyan bi eslê xwe Ermenî ye û di 19ê Tîrmeha sala 1960ê de li bajarê Qahîreyê yê Misirê ji dayîk bûye.

Atom Egoyan yek ji nûnerên rêbaza Pêla Nû ya Torontoyê bû, ev rêbaza sînemayê ji salên 1980an destpê kir ku bi giştî ji çêkerên fîlman pêk hatibû. Derhênerê biserketî û yek ji derhênerên herî resen ên sînemaya cîhanê Egoyan, di fîlmên xwe de bi piranî qala mijarên têkiliyên mirovan, hîsên tenêtî û bêwelatîyê, jiyana piştî trawmayê, têgihana berrahiyê û bandorên teknolojîyê dike.

**Jiyan û fîlmên wî:**

Derhêner Atom Egoyan bi eslê xwe ji Ermenîyên Misirê ye û bi xwişka xwe ya Eveyê ku pîyanîsteke navdar e, li bajarê Victoriayê mezin dibin. Egoyan bi lîstikvana navdar Arsine Khanjian re zewiciye û du zarokên wan hene.

Di salên dibistanê de dest bi nivîsandina senaryoyê dike û di bin bandora her du wêjekarên navdar ên Samuel Beckett'in û Harold Pinterî de dimîne. Li Trinity Collegeê ya Zanîngeha Torontoyê xwendiye û bi kurtefîlmên xwe yên “Lust of a Eunuch” (1977) û “Howard in Particular” (1979) ve dest bi kişandina fîlman dike. Di 1984ê de jî yekem metrajdirêj ê xwe yê “Next of Kin”ê dikişîne.

Derhêner, di sala 1994ê de bi fîlmê xwe yê bi navê “Exotica”yê li seranserî cîhanê tê naskirin û fîlmê wî ji Festîvalên Fîlman ên Cannes, Sundance, Toronto û Locarnoyê xelat digire. Piştî vî fîlmî xwe, bi gelek fîlmên biserketî ve derdikeve li pêşberî temaşevanên sînemayê.

Di sala 1997ê de fîlmê wî yê “The Sweet Hereafter”ê dikeve vîzyonê ku mijara fîlmî li ser çîroka jiyana ajokereke otobûsê ye. Fîlm, ji bo Xelatên Oscarê bûbû berendam û ji Festîvala Fîlman a Cannesê 3 xelat girtibû. Piştî du salan jî fîlmê wî yê “Felicia’s Journey” (1999) tê kişandin, mijara fîlmî li herêma çolter a Îrlandayê diqewime. Fîlm, behsa jiyana Felicayê dike ku ji bo evîna xwe diçe Îngilistanê. Felicia’s Journey, li Festîvalên Fîlman ên Cannes, Toronto, Rotterdam, New York, Selanîk, Valladolid û li Xelatên Genie û Bodilê derketiye li pêşberî sînemahezan û gelek xelat wergirtine.

Derhênerê navdar, di fîlmê xwe yê “Ararat”ê (2002) de qala mijarên dîrokî kiriye, lê di fîlmên xwe yên din de bi giştî ji mijarên dîrokî dûr ketiye. Fîlmê “Ararat” li seranserê cîhanê gelek deng vedaye ku qala komkujiya Ermenîyan dike. Di navbera dîroknas û rojnamegeran de li ser vî fîlmî nîqaşên dîrokî derketine. Fîlm, li çarçoveya bernameya gelek festîvalên fîlman ên cîhanê hatî nîşandan, ji Yekîtiya Derhênerên Kenedayê û ji Festîvalên Fîlman ên Êrîvan, Durban û Genieyê di gelek beşan de xelat girtine.

Di 2005ê de bi fîlmê "Where the Truth Lies" û piştî sê salan jî bi fîlmê xwe yê "Adoration" (2008) ve ji nû ve derdikeve li pêşberî temaşevanan. Di fîlmê Adorationê de dê û bavê Simonî ji ber qedaya trafîkê jiyanên xwe ji dest dane, rojek Simon li dibistanê gotereke dixwîne û piştî wê çîroka dê û bavê xwe hêdî hêdî kifş dike. Derhêner bi vî fîlmî re jî li cîhanê deng vedaye û ji Festîvalên Fîlman ên Cannes, Toronto, Sao Paulo, Londonê xelat girtine.

Egoyan di sala 2009ê de bi fîlmê xwe yê "Chloe"ê de têkiliya jin û mêrekî dide ber çavan û ev fîlm di heman demê de di destpêka Festîvala Fîlman a San Sebastianê de hatiye nîşandan.

Di fîlmê xwe yê bi navê "Remember"ê (2016) de li ser jiyana mirovekî kal ê Zev Guttmanî ku li xweytîxaneyeke bajarê New Yorkê dimîne, disekine. Guttman, ji komkujiya Cihûyan rizgar bûye û piştî gelek salan kujerê malbata xwe peyde dike. Fîlm, ji Xelatên Ekranê yên Kenedayê xelata Senaryoya Resen girtiye.

Agoyan, herî dawî di sala 2019ê de fîlmekî bi navê "Guest of Honour" kişand û fîlmê wî ji bo xelata Şêrê Zêrîn a Festîvala Fîlman a Venedîkê bûbû berdendam.

Derhêner Atom Egoyan di sala 2015ê de bi Nîşaneya Governor Generalê hatibû xelatkirin ku xelata herî biprestîj a Kenedayê ye. Nîşaneya Governor Generalê ji aliyê nûnerê/a Şahitîya Îngilistanê û Governor General (Parêzgarê/a Bilind) ve têne dayîn û li Kenedayê nîşaneya herî girîng a xebatên hunerê tê qebûlkirin.*

**Fîlmên din ên Atom Egoyanî:**

**Fîlmên Dirêj:** Family Viewing (1987), Speaking Parts (1989), The Adjuster (1991), Calender (1993), Devil's Knot (2013), "The Captive"

**Fîlmên Televîzyonê:** In This Corner (1985), Gross Misconduct (1993), Sarabande (1997), Krapp's Last Tape (2000).

**Kurtefîlm:** After Grad with Dad (1980), Peep Show (1981), Open House (1982), Men: A Passion Playground (1985), Looking for Nothing (1988), Motreal Stories (1991), A Portrait of Arshile (1995), The Line (2000), Diaspora (2001), Close (Bi hunermend Julião Sarmento re, 2001) To Each His Cinema (2007), Festival du Nouveau Cinéma (2014).

**Belgefîlm:** Citadel (2003), Venezia 70 Future Reload (2013).


**Vîdyo:** Bluebeard's Castle (2022)

**Çavkanî:**

https://en.wikipedia.org/wiki/Atom_Egoyan

https://www.agos.com.tr/tr/yazi/11804/egoyana-kanadadan-krali-yet-nisani

https://www.imdb.com/name/nm0000382






# OKSÎJENA LI DINYAYÊ ÇAWA ÇÊBÛ?

DIGIKURD






Heke em bixwazin makîneyekê saz bikin û vegerin paşeroja dinyayê, em ê poşman bibin. Lewra wê gelek tiştên xirab li hêviya me bin. Em ê tenê di nav çend deqeyan de ji ber bêoksînejiyê bimirin.

Gava gerstêrka me nû ava bû, di atmosferê de tu oksîjen tunebû. Zanyar dibêjin çêbûna vê gazê beriya 2,5 milyar salî destpê kiriye.

Pêkhatina oksîjenê ya di atmosferê de wek "Karesata Mezin a Oksîdasyonê" tê binavkirin. Ev yek, yek ji bûyerên herî girîng ên rabirdûya gerstêrka me ye. Heke oksîjen çênebûya niha îro li ser rûyê erdê tu jîndar tunebû.

**Baş e, lê oksîjen çawa pêk hat?**

Bi salan in zanyar li ser pêkhatina oksîjena li dinyayê lêkolînê dikin. Zanyar demeke dirêj e dibêjin, di çêbûna oksîjenê de rola jîndaran heye. Lê ew ne jîndarên asayî ne.

Heke ev daneyên dawîn werin piştrastkirin, beriya Karesata Mezin a Oksîdasyonê jiyan vediguherî. Seba ku em paşerojê baş fam bikin, ew pêngava peresînê dibe ku riya rast nîşanê me bide.

Beriya 4,5 milyar salî dinyaya me ava bû. Karesata Mezin a Oksîdasyonê çawa çêbû dinya hêj 2 milyar salî bû.

**Li ser rûyê dinyayê tenê jîndarên yekxaneyî hebûn.**

Em hêj baş nizanin bê ka li dinyayê jiyan kengî destpê kiriye. Lê fosîlên herî kevn ên wan mîkro-organîzmayan ji 3,5 milyar sal berê ne. Yanê li gorî vê, milyareke sal beriya Karesata Mezin a Oksîdasyonê li rûyê erdê jiyan hebûye.

**Rola Siyanobakteriyan**

Hizra zanyaran ew e ku ev jîndarên biçûk û kêm-mekanîzma, rola xwe di Karesata Mezin a Oksîdasyonê de hebûye. Ev organîzmayên mîkroskobîk ku wek siyanobakterî tên binavkirin, nemaze li ser behr û golan tabaqeyeke şîn û kesk çêdikin.

Ev organîzma gava nû derketibûn ji tavê enerjî digirtin, bi av û karbondîoksîdê jî şekir çêdikirin. Ango wan çerxa fotosentezê digerand. Îro hemû nebat û keskahî wisa zikê xwe têr dikin.

Lê ew jî têra me nake ku em bizanin oksîjen kengî pêk hatiye. Lewra siyanobakterî gelek beri-

ya Karesata Mezin a Oksîdayonê derketibûn. Zanyar wisa bawer in ew yek ji organîzmayên ewil ên erdê ne. Hin lêkolîn destnîşan dike ku nifşê wan digihîje beriya 3,5 milyar salan.

**Bakteriyên pir-xane**

Di siyanobakteriyên modern de gelek taybetmendiyên cuda hene. Piraniya bakteriyan ji xwe yek-xane ne, lê siyanobakterî him pir-xane him jî bi awayekî lîmfatîk in.

Gelek ji wan dikarin xaneyên taybet jî hilberînin û herwiha hin xaneyên hilberandî zêde jî nabin. Hin kes wisa bawer in; xaneyên taybet yên di masûlke, tûre û xaneyên xwînê de jî bi vî awayî çêbûne.


Li aliyê din, fikra sereke ew e ku koma jîndarên pir-xane digihîje 2,5 milyar sal berê, ango beriya Karesata Mezin a Oksîdayonê.

Sedem û encama wê çi dibe bila bibe okdîsdasyon yek ji bûyerên herî girîng ên gerstêrka me ye. Di destpêkê de ji ber oksîdasyonê gelek bakterî mirin, lê wek demeke dirêj ew bû wesîleya çêbûna gelek jîndaran. Jiyanên cuda bi wê destpê kirin. Jîndaran oksîjena ku dişewite wek sotemeniyeke jîyanwar bi kar anî.

Organîzmayên ku oksîjenê digirtin zêdetir çalak û mezin dibûn. Bi saya wê jî peresîn destpê kir. Ji siyanobakteriyan nebat û ajal çêbûn. Piştre kurm, masî, amfîbî û herî dawî jî mirov pêk hatin.

Ger hemû îdîa rast bin destpêka çêbûna jîndarên curbicur dibe ku bi saya siyanobakteriyê be.






# Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingeheka sazgehiyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

## Kovarên Endam




/KovargerenKurd

KovargerenKurd@gmail.com

# The Hall Kurdî

Endama Koma Kovargerên Kurd e